ROMANA FENOMENÊN ENDÎVÎDUWEL

Loqman Polat

Jiyana edebî bi afirandina berhemên nû yên edebî her diçe dewlemend dibe. Cîhana romana heyama nû bi kar û xebata kulturî, edebî û berhem afirandinê pêşve diçe, berfireh dibe û hejmara nivîskaran zêde dibe. Bi weşandina her romaneke nû ya bi kurdî li nivîskarên kurd yên romannivîser yek zêde dike. Zêdebûna helbestvan, çîroknivîs û romannivîserên kurd ji bo pêşveçûna edebiyata kurdî hêjayiyên giranbiha ye. Edebiyata kurdî bi berhemkariya nivîskarên kurd yên heyî û bi berhemên nû yên nivîskarên nû dewlemend dibe. Lewre jî her pirtûkeka kurdî ya nû hêjayiyeke zêdebûna berhemên kurdî ye.

Hinek romannivîser di romanên xwe yên yekem de bi ser dikevin. Hinek jî bi romanên xwe yên yekem bi ser nakevin, lê belê bi romanên xwe yên duyem û yên din bi ser dikevin. Yên ku bi romanên xwe yên yekem bi ser dikevin, romannivîseriya xwe didomînin û her diçe romanên hîn baştir diafirînin.

Lokman Ayebe yek ji wan romannivîserên kurd e ku di nivîsîna romana xwe ya yekem de bi ser ketiye. Ez ji romanên yekem ango ji romana pêşî ya nivîskaran hez dikim. Min ji romana xwe ya yekem "Kewa Marî Mêkew" gelek hez kir. Dema min romana xwe ya pêşî nivîsî û weşand, Mehmet Uzun, Hesenê Metê, Firat Cewerî û hinek nivîskarên din gotin: "Romaneke baş e. Tu bi nivîsîna vê romana xwe ya pêşî bi serketî û divê tu romannivîseriya xwe bidomînî." Min domand û li pey wê romanê min romanên xwe yên bi navê "Fîlozof" , "Rojnamevan" , "Nûrheyata Licî" , "Robîn" û "Kodnav Viyan" nivîsî û weşand. Di van salên dawîn de min bi nivîsîna

rêzeromaneke ku ji sê pirtûkên berdewamên hevin pêk tê nivîsî û ez di jiyana xwe ya nivîskariyê de gihîştim radeyeke bilind. Ez hêvîdarim ku dê Lokman Ayebe jî piştî vê romana xwe ya yekem, dê hêj gelek romanên din binivîse.

Herçiqas Lokman Ayebe romaneke monoton, bê tevger, psikolojik, derûniya xirab ya lehengê romanê, bêhêvî û bedbînî nivîsiye jî, dîsa jî bi min li gor pîvanên edebî û hunera romanê bi ser ketiye. Helbijartina mijara vê romanê bi xwe mêrxasiye. Di civakeke paşvemayî de, di nav însanên ku piraniya wan homofobî ne, mijara têkiliya cinsî ya nêr bi nêr re, ji hevûdu hezkirina mêr bi mêr re tişteke wisa hêsan nîn e û jê re cesaret dixwaze. Lokman Ayebe vê cesaretê nîşan daye.

Li Ewropayê romanên bi vî rengî gelek in. Nivîskarekî Ewropî bi hêsanî dikare li ser homoseksuelan, lezbiyenan, bîseksuelan û hwd, çîrok û roman binivîse û têkiliyên wan yên endîvîduwel bike mijara çîrok û romanên xwe. Di nav edebiyata kurdî de ev cara yekem e ku romaneke bi vî rengî tê weşandin.

Di nav civakên paşvemayî de kesên homoseksuel yên din in, yên derveyê civakê ne. Civak li wan weke kesên nexweş dinêre û hinek kes wan bi "sapik"iyê sucdar dikin. Ew vî tiştî ji bo wan weke tercîheke pevşabûnê, weke şêweyeke şadimanîyê qebûl nakin. Û lewre jî ji tercîha wan ya cinsî û seksî re rêzdarî nîşan nadin û wan mahkûm dikin.

Divê her însan di têkilî û tercîha xwe ya cinsî û seksî de azad be. Ew bê zorê û bê ku zirarê bide kesê, ji xwe re bi hevalê xwe re çi dike bila bike. Ji bo vê tercîha wî / wê heqê kesê tune ku rewşa wan weke şermezarî bide nîşandan, wan mahkûm bike û li wan neheqî û heqaret bike.

Di romanê de têkiliya du kesên nêr, ango du zilaman û ji hevûdu hezkirina wan ya bi hevûdu re heye. Herçiqas nivîskarê romanê Lokman Ayebe vê mijara balkêş helbijartiye jî, di nav rûpelên romanê de diyar dibe ku nivîskar hinek tirsiyaye û xwe bi xwe otosansur kiriye. Wî di têkiliyên cinsî, seksualî yên di nav du zilaman de hevsar jidandiye, serê hespê bernedaye û pênûsa xwe kol kiriye.

Bûyerên romanê, têkiliyên Sermest û hevalên xwe di nav 5 rojan de tê qalkirin. Hevalekî Sermest ku navî Jar bûye, xwe kuştiye, ango întîxar kiriye. Wî ji bo çi xwe kuştiye di beşa yekem de, ango di roja Şemî'yê de ne diyar e. Sermest diçe ser mezelê wî û roman dest pê dike. Paşî çi dibe, çi tê serê Sermest, psîkolojiya wî ji ber çi xirab dibe û di dawiyê de çima ew jî xwe dikuje? Ez behsa van tiştan, ango behsa herikandina naveroka romanê nakim. Bila xwendevan bixwîne û bibîne bi çi çima, ji bo çi weha bûye û dawî çawa dibe?...

Li bakurê welêt, gelek nivîskarên nû derketin û Lokman Ayebe jî yek ji wan e. Digel ku nivîskarekî ciwan û nûye jî, li gorê kurmanciya standart ya nivîsînê zimanê Lokman Ayebe baş e. Mijara romanê jî baş e. Di nav herikandina tevna romanê de di ber têkîliya Sermêst û Dilşêd û hevalê wan yê xwekuştî de, mirov li rastî rastiya hin kesayetiyên civaka kurd û nakokiyên kesayetiyan yên bi civakê re jî dihêt.

"Ji aliyê tevn, teknîka vegotinê û naveroka xwe ve û heger mirov temenê nivîskarê wê yê ciwan û pêvajoya kurt ku wî tê de ev roman nivîsandiye (13 roj) jî lê zêde bike, romaneke balkêş û hêja ye ku mirov serê xwe zêdetir pê re biêşîne.

Ji ber van taybetmendiyên xwe yên jorê û birêvebirina bûyerên romanê ve, Lokman Ayebe weha xuya dibe ku dê di nava cîhana romana "Heyama Nû" de cihekî baş û heqkirî bi dest bixe."

Romana Lokman Ayebe "Jar Lê Sermest" di nav weşanên "Belkî" de li Amedê hatiye weşandin. Li Amedê çend weşanxaneyên kurd hene û ew berhemên nivîskarên nû diweşînin. Weşanxaneyên kurd yên li Amedê (weşanên Lîs, Belkî, Bîr, Deng, Mizgîn) gelek pirtûkên kurdî û hinek jê jî kovarên kurdî tirkî diweşînin. Kovara Deng, Bîr û Mizgîn li Amedê derdikevin.